

Gotûbêj digel Bêhrûz Bûçani*

Bêhrûz Bûçani jidayîkbûyê sala 1983`an li Îlamê ye, Îlam wê demê toza şer li ser rûmetên wê rûniştibû, û Bêhrûz jî di nava wê xubarê de mezin bû, qonaxa paşnavendî li Îlamê derbas kir, û bo xwendina zankoyê çû Tehranê, û karnasiya bilind a jeopolîtîkê li zankoya Tehranê bi dawî anî. Piştî wek rojnamevan û çalakê mafê mirovan û nivîser dest bi kar kir. Li sala 2013`an hêzên ewlekariyê ên Komara Îslamî hewl didin ku navbirî destbiser bikin, ew jî bi neçarî ji Îranê derdikeve û piştî heşt mehan digihîje Ustraliyayê, û ji aliyê dewleta Ustraliyayê ve bo girava Manûs tê dûrxistin, û li wir şeş salan li kempekê ku zêdetir wek girtîgehê bû, di bin çavdêriyê de dijî. Di vê girtîgehê de serpêhatiya xwe di qalibê romanekê li jêr navê “Ti hevaley xeynî çiyayan” nivîsand, herçend ku çawaniya nivîsîna vê romanê jî ji jiyana pir ji êş û azar a nivîser ne cuda ye. Ev roman bi mobaylekê tê nivîsîn û ji bo hevaleyê wî tê şandin heya ku wê wergerîne ser Îngilîzî.

Romana “Ti hevaley xeynî çiyayan” hikayeta mirovekî kurd e, mirovek ku li nîştimana xwe ji mafên herî kêr jî bêpar e û li jêr siya rejîmeke totalîter dijî û civaka cîhanî jî guhê xwe li hember vê rastiyê kerr kiriye.

Bêhrûz niha li bajarê Christchurch li Niyozlendê dijî. Ew piştî azadbûna ji girtîgeha Manûs çend mijaran derbarê mafê mirovan û penaberî û ... hwd di rojnameyên naskirî ên Îngilîzîzman ji wan di rojnameya Gardiyan de belav kiriye.

Pirsa yekem: Parêzgehên Kirmaşan û Îlam ew herêman in ku hem navenda deshilata Heseniye a kurdî bûne û hevdem nîştimana jidayîkbûna ayîne Yarsan jî bûne. Hûn pêgeha vê ayîne di vê herêma de çawa dinirxînin?

Bersiv: Peyva “Kurdistan” bixwe di serdema selcûqiyân de, û herwiha piştî di gelek çavkaniyan de, bi van herêman dihate gotin ku di çavkaniyên rojavayî de jî qala wan hatiye kirin. Bajarên Dînewer û Şarezûr wek pêkhînerên sereke ên çand û siyaseta kurdî heya dewraneke dûrûdirêj rol lîstine. Edebiyata Goranî beşeke girîng ji edebiyata kilsîk a kurdî ye ku rast di wê herêma de dewraneke biçirûsk hebûye û heya îrorojê jî bandora wê dikare bê dîtin. Ayîne Yarsan jî rast di van herêman de çêbûye û heya çendîn sedsalan kultur û tore û bawerî û cîhanbîniya xelkê herêma xistiye bin bandora xwe de, û hêla jî ger em lêkolîneke kûr û xelknasane li ser kultura giştî a xelkê vê herêma bikin, em dikarin ku bandora ayîne Yarsan li ser derşi`ûra xelkê vê herêma bibînin. Rast e ku ayîne Yarsan niha xelkekî kêmtir peyrewiyê jê dikin, lê niha jî bawerî û istûre û deb û nerîtên xelkê li jêr bandora vê ayîne de ye. Di vir de mebest ew xelk e ku em îrorojê wek kurdên şî`e wan nas dikin. Ger em bi awayekî giştî lê binêrin, Kurdistan hertim nîştîmanek bûye ku li hemberî dînen tekxwedêyî li ber xwe dide, û ev berxwedaniya çî li dewrana Mîtrayîzm û Zerdeştî û çî jî li dewrana Îslamî û serhildana ayîne Yarsan peyda bûye. Ew hinda ku ez ji ayîne Yarsan fêhm dikim, ew ayînek e ku hertim li ser koka çanda berxwedanê çûye

pêş, lewra jî ew yek bo wî xelkê ku ji derbasbûyîya dîrokî dûr ketine û di cîhana îro de, di nav proseya asîmîlasyonê de hêdî hêdî ji nav diçin, hebûn û bandora çand û cîhanbîniya Yarsan şans û dereta herî mezin e, û her niha jî ger em lê binêrin, nefesên herî dawî ên bibandor ên edeb û hunera kurd di nav civaka Yarsan de û yan jî piştqahîm bi çanda Yarsan e ku tê hilkişan. Di vê rewşa jinavçûna çandî û siyasî a îroyîn de pêkhînanana têkiliyan bi navendên berxwedanê re di nav çanda Yarsan de wek deskevtekê tê hesabandin.

Pirsa duyem: Gelek ji çavdêr û çalakên çandî û siyasî, asîmîlasyonê wek pirsê herî sereke li herêmên Îlam û Kirmaşanê dizanin, gelo mirov dikare ji bo wan kironolojiyekê berçav bigre?

Bersiv: Bi raya min divê ku destpêkê em pênaseyekê ji asîmîlasyonê bikin, heya ku em bikarin di dîrokê de vê yekê destnîşan bikin ku di çi demekê de civak bi awayekî kûr daketiye. Bo gelek aliyan asîmîlasyon tenê sînordar e bi biyavê zimanî, lê asîmîlasyon têgeheke çendbiyavî ye, ku vêdedana ziman yan jî ji holê rakirinê wê dawî qonaxa vê proseyê ye. Asîmîlasyon bi zimanê sade pêvajoya lawazbûna nasnameyî a civaka jêrdest li her mberî nîrx û pêkhateyên civaka serdest e, û cergeyên kûr ên derûnnasane hene. Divê ku em vê pirsê bikin ku çima civakek digihîje pileyekê ku digel nîrx û navendên çandî û dîrokî ên xwe bîhanî dibe û di rastî de rastî veqetiyane tê? Ez hertim zêdetir li ser bingeha ceribandîna jiyana xwe berbirûyê asîmîlasyonê bûme heya di warê teorîk yan akademîk de. Jiber ku di vê temenê xwe ê kurt de, ez şahid bûme ku çawa di heyama çend salan de piraniya xelkê bajarekî biryar dane ku digel zarokên xwe bi zimanê farsî biaxifin, di rastî de min dîtine ku çawa bi hezaran hezar peyvî di heyama çend salan de bo heta heta hatine jibîrkin û di rastî ew yek mirov şok dîke. Asîmîlasyon wek lehiyekê ye ku di carekê de êrîş dîke, lê nabe ji bîra mirov here ku di biyavên curbicur de çendî dehikan berî niha di derşî ûra civakê de dest pê kiriye. Xala destpêkê a hereketa asîmîlasyonê vedigere ser çawaniya berbirûbûna xelkê digel modernîzmê. Bi baldan bi hêza zal ya navenda deshilatê, her navendeke modern çi hizreke siyasî be û çi jî teknoloji, destpêkê gihîştîye navenda deshilatê. Di rastî de têgihîştina me ji xalên pêkhînerê modernîzmê ji hundirê gotar û pergala siyasî ve çavkanî digre, û derşî ûra xelkê me wiha dixê bin bandora xwe ku her çi morden e farsî ye, û her çi paşve maye kurdî ye. Eva rastiyeke e ku di hişê mirovekî asîmîlebûyî de rû dide, wate rast herifîneke tewaweyar a derûnî. Pêvajoya asîmîlasyonê berevajiyê hizirîna gelek aliyan rast ji dewrana Rizaxan û pêkhînanana pergala perwerdeyî a modern dest pê nekiriye, belku vedigere bo serdema Qacaran û koçberkirina malbatên fars bo Kirmaşanê bi armanca şî`esaziyê, ku helbet di serdema Rizaxan de ev pêvajoyê bi awayekî sistematîktir û bileztir ber bi pêşve çû, û piştî şoreşa 1979`an digel giştîgîrbûna perwerdehiyê û hebûna ragehandîna dengî û rengî kûrtir bû, ji bîra me neçe ku yekem qurbanî bajarê Kirmaşanê bixwe bû, û piştî gihîştê bajarên din û niha jî gundan.

Pirsa sêyem: Îranê ti demekê ezmûna demokrasiyê tunebûye, gelo sed salan sîstema dîktatoriyê bandora xwe li ser proseya asîmîlasyonê hebûye?

Bersiv: Proseya asîmîlasyonê di bingeheke de bêy sîstema dîktatorî ne form digre, û ne jî dikare wisa bi vî rengî here pêş. Ger xelk yan jî çalakên siyasî yan jî çandî ên me, bigihîjin vê rastiyeke ku xewna pergala yan pêkhateya navendê jinavçûna mutelq a çand û nasnameya kurdî ye, û ne

lawazkirin û yan jî vêdedana wê, em dikarin bêjin ku em pêngavekê ber bi pêş ve çûne. Ez vê yekê lewra dibêjim ku hêšta jî kesên wiha hene ku ew qas reşbînane lê nanihêrin, lê ev yek reşbînî nîne belku rastî û hewceyî ye.

Pirsa çarem: Rola zaraweya Goranî ku beşeke mezin ji edebiyata kevn a kurdî bi wê zaraweyê hatiye nivîsîn, di edebiyata Îlam û Kirmaşanê de çawa dibîne?

Bersiv: Goranî zimanê zal ê edebiyat û helbesta herêmê bûye, ku piştî sedsala heftem heya heyameke dirêj vegeşîn ceribandîye, helbet ez vê yekê jî bêjim ku têgihîştineke şaş heye ku edebiyata Goranî di vê qoaxê de şikil girtiye. Jiber ku berî vê dîrokê ji hezar û sed salan berî niha ve hindêk berhem bi cih mane. Têgihîştina giştî ew e ku edebiyata kilasîk a Goranî reh û rîşeya mesebî heye, lê di rastî de em rastî edebiyatekê tîn, ku reh û rîşeya ayînî-felsefî heye, û di hindêk dewreyan de jî berhemên arifane û aşiqane jî xelq dibe, ku du mînakên wê “Xulamrizaxan Erkewazî” û “Seyî Yaqû Maydeştî” ne. Xaleke din a girîng ew e ku pêkhateya helbestê li edebiyata Goranî dehcayî ye, û gelek cuda ye digel edebiyata farsî û soranî ku li jêr bandora pêkhateya erozî de ne. Vê pêkhateya dehcayî kariye ku bigihîje cîhana modern jî, û hêla jî em dikarin berhemên wisa bixwînin, ku di vê pêkhateyê de lê di nav rewşeke modern û bajarî de tîne berhemanîn, heya cihekî ku heta helbestvanekî pêşeng wek Se`îd Banan helbestên bihêz di vî warî de hene. Renge zêdetirîn bandorek ku edebiyata kilasîk a Goranî li ser cîhana wêjeyê a îro hebûye û renga heya îro jî hebe, hebûna vê pêkhateya dehcayî ye. Bi awayekî giştî em dikarin bêjin ku Goranî zimanê zal ê wêjeya kilasîk a vê herêmê bûye. Lê di dewrana modern de aram aram paşve vedikêşe, û em dibînin ku du helbestvanên mezin ên Kirmaşanê di destpêka sedsala niha wate Şamiyê Kirmaşanî û Pertow Kirmaşanî bi Kelhurî helbest gotine. Nîvê duyem ê dehika 70`î dîrokeke gelek girîng di edebiyata kurdî li Îlam û Kirmaşanê de ne. Di vê dewreyê de tevgera helbestê form digre, ku heya niha deskevtên berçav hebûne. Di rastî de di rewşeke asîmîlebûyî de ku kurdî ber bi lêva kendalê jibîrçûnê tê paldan em dibînin ku helbesta kurdî riya xwe vedike û dibe emrazeke girîng li dijî proseya asîmîlasyonê. Ya ku girîng e ezmûna helbestê di rewşeke bajarî û modern û di qalibên helbestê, xeyrî mînaka kilasîk a dehcayî ye, ku qalibeke sereke heya sedsalan bûye. Helbesta Kurdî hem di pêkhate û hem jî di naverokê de xwe nîşan daye, û niha jî em dibînin ku ev helbest di xizmeta xureka muzîkê de dibe. Niha ev tevger tenê sînordar nemaye bi helbestê, û ber bi aliyê pexşan û çîroknivîsiyê ve hereket dike, û eva qonaxê nû ye ku niha di destpêka riya xwe de ye. Her di vê sala borî de koma destana “serên neteraz” ji Jiyar Cehanferd belav bû, ku mizgînîderê dewreyê nû ji wêjeyê di vê herêmê de ye. Ev tevgera helbest û edebiyatê a di rastî de balkêş hêvîdarker e.

Pirsa pêncem: Yek ji stûnên nasnameya Îranî nasnameya şî`etiyê ye, û her wek em dizanin piraniya rûniştvanên herêmên başûrî ên Rojhilatê Kurdistanê şî`emeseb in, bi vî halî û li ser bingeha serjimêriyên me di pêncî salên borî de ew herêm di warê hejariyê de yek ji herêmên

herî hejar e. Bi baldan bi vê xalê ku derbarê Îranê de tê gotin ku tirkên akinciyê Îranê bi sedema şî`ebûnê rewşa wan a aborî baştir e, bi baweriya we sedema vê ku heta şî`ebûna herêmên kurdnişîn jî sebebek bona ragirtina pêvajoya destengiya sistematîk ji aliyê Komara Îslamî ve nebûye çi ye?

Bersiv: Di rast de ev şêwaza lênihêrîna li vê meselê û baskirin ji meseb wek meseleyekê ku ketibe qeraxê (perawêzê), eva mexlete ye, û çavkaniya wê vedigere ser gotara farsî ku dixwaze ferq û cudahiya neteweyî ret bike. Rast e ku sunî di warê mesebî de berbirûyê ferq û cudahîdanîneke zêde bûne, lê em rastî koloniyalîzma navxweyî bûne, ku bi çavê kêmtir li etnîkan dinêre. Di dewreya Pehlewî de ku aliyê kêmtir pergale îdi`a dikir ku li ser bingeha vegeşandina şî`egeriyê nehatiye avakirin, lê dîsan jî Kurdistan di warê vegeşînê de paşve hatibû hêştin, eva ku çima tirk pareke zêde a vgeşînê ber wan ketiye, sedemên curbicur ên dîrokî, çandî û erdnîgarî hene, lê bi diyarîkirî derbarê Kurdistanê de esla bingeşînê kurdûn e, em ji bîr nekin ku hişmendîya navendîtiyê ku xewnek xeynî ji holê rakirina kurdan tune ye, amade nîne ku ji deskevtên xwe di warê asîmîlekirina kurdên wê herêmê dest hilgire û di odeya fikirînê a xwe de dibêje, çima em wan deskevtan bi vegeşînê bixin metirsiyê. Herçend ku ev yek rast nezanî ye, ku kesek wiha hizir bike ku nevegeşîyan riya herî rihet bo kontrol û serkute ye, lê ew wiha hizir dikin, ger xeyrî vê yekê bûya, bêguman wan jî bêparî bi ser Kurdistanê de nedisepandin.

Pirsa şeşm: Di pêvajoya asîmîlasiyona başûrê Rojhilatê Kurdistanê rewşa jinan hûn çawa dinirxînin?

Bersiv: Yek ji cergeyên peyva asîmîlasiyonê û proseya asîmîlasiyonê behsa zayend û dijezimanîyê ye, bi awayekî eşkere rewşa gund û bajaran dijezayend e, lê ew dijezayend di rewşa ziman de cardin tê berhemanîn, bi awayekî ku van rojan di rewşa civakî de tu wisa hizir dikî ku hemîyan qebûl kiriye ku divê digel jinan bi farsî biaxifin û digel mêran bi kurdî! Bo çavdêrekî derveyî ku ceribandineke jiyankirinê di warê berbirûbûna digel asîmîlasiyonê tunebûye, eva rewşa herî neasayî ye, di demekê de ku bo xelkê ev dîmen xwezayî tê dîtin. Ev rewşa ku kurdî wek nêrîne tê pênasekirin û farsî jî jinane, tenê di civakeke mêrserdest de ku diqewime, û girêdayî mîkanîzma deshilatê ye. Bêguman ger çand û civaka kurdî mêrserdest nebû, proseya asîmîlasiyonê bi vê tundiyê kûr nedibû, yan jî ger ew bûyer qewimîba, rewşeke wiha ya pêkenok bi xwe ve nedigirt ku pirs ziman bibe pirseke zayendî. Herçend ku eva tenê biyaveke meselê ye, û beşeke wê vedigere ser hişmendîya deshilatdarên şî`e, ku jinê tenê di rola dayîkê û perwerdeya zarokan de dibînin û bi başî jî jê re bernamerêjîyê dikin, û dizanin ku çiqas girîng e ku di proseya asîmîlasiyonê li ser jinan bisekinin, û ger serkevtî bin, di domê de û di rewşên mêrane de jî dijezimanî rû dide. Helbet vê yekê jî em bêjin ku di rastî de me hewceyî heye ku jinan cergeyên aloz ên zayend û asîmîlasiyonê şîrove bikin, ya ku min got di rastî de ew e ku min bi çav dîtiye. Bona nehêlana koloniyalîzmê di mêjiyan û rihên asîmîlebûyî de eva jin in ku divê pêşeng bin, û rewşa siyaset û ragehandin û çanda kurdî divê ku di berjewendîya jinan de vala bikin.

Pirsa heftem: Di sed salên borî de tevgera kurdî li Rojhilatê Kurdistanê hebû. Hûn pêgeha vê tevgerê di warê pêşgirtina ji asîmîlasyonê li herêmên başûrî ên Rojhilatê Kurdistanê çawa dinirxînin, yan rexneya we li ser vê tevgerê derheqê pirsasîmîlasyonê çi ye?

Bersiv: Bi awayekî dîrokî derfeteke mezin ji dest derketiye, li dewreya formgirtina tevgera kurdî li Kurdistana Mokeriyana herêma me hate jibîrkin û qadeke bê rikeber bo vegeşandina îdeyên îranşehrî hate pêkanîn, di rastî de hizra siyasî a kurdî li heman herêma soranî hate sînardarkirin, ku piştî tevgera kurdî di tewahiya vê sedsalê de û di qonaxên curbicur ên dîrokî de nirxa wê bi awayên curbicur daye, û hêla jî ev herêm ji nebûna hizra siyasî êş û azarê dikşîne. Renge ger wê serdemê hewleke herî kêma bona pêkhînanana rêxistineke siyasî li wê herêmê hatiba dan, îrorojê me dikarî aliyê kêma bi vegeşandina bo guman û ferziye (Hypothesis) ên ku di dîna mirov de ne, û di derşîûra bikom de cih girtibû, yan bi pêdagiriya li ser bîreweriyên siyasî herçend jebela û kêmevegeşiyayî, hêsantir civakê digel çanda berxwedaniyê pêkve girê bidin. Di wê dewreyê de ku di dirêjahiya vê sedsalê de ragehandina kurdî jî bi tewahî soranîtewer bûye, li vir e ku veqetiyana di navbera herêma me û Kurdistanê bi giştî kûrtir dibe. Helbet beşek ji vê soranîtewerê ji hişmendiya mesebî a soraniyan ve çavkanî digre, û ew her ji heman destpêkê ve ev pêşferz qebûl kiribûn ku xelkê vê herêmê şî'e ne lewre digel navenda deshilatê hevdil in û şiyana wan a girêdana bi tevgera kurdî tune. Guherînkariyên du dehekê dawiyê selimand ku çiqas ev hişmendiya şaş e, jiber ku di bingeh de kurdbûn bo xelkê vê herêmê girîngiyeke zêde heye.

Pirsa heşt: Texa rewşenbîr a Kurd di warê berbirûbûna digel asîmîlasyonê herêmên başûrî ên Rojhilatê Kurdistanê divê çi bikin?

Bersiv: Berê jî me qala vê yekê kir ku di rastî de asîmîlasyon ji wir ve dest pê dibe ku xalên pêkhînerê çanda modern ji rîya pergala farsî ve digihîje civaka me. Bona berbirûbûna digel wê divê ku em bikarin çanda kurdî di rewşa bajarîtir û moderntir de pêşkêş bikin. Me bi muzîk û sînema û heta berhemên çandî û sergermiyê hewceyî heye ku dîmeneke rojevkirî ji kurd raxe berçavan, ku helbet ew yek nayê wateya berçavnegirtina kevneşopî û huner û çanda folklorê, tenê divê ku di nav platformekê de amade be ku bersivderê hewceyiyên nifşa nû be. Ev lînehîrîn gelek cuda ye digel formeke nezanhesibandî ku di hundirê berhemên kirêt ên

ragehandinî û çandî ên deshilatê derdikevin û dixin nav civakê de, û armanca wan ew e ku civakê ji siyaseta radîkal vala bikin. Eva ku ez dibêjim li derbarê nifşeke asîmîlebûyî de ye ku dema stranbêjê fars ê “sasî manken” dibîne, ji hişê xwe diçe.

* Ev mijara yekem car bi zimanê farsî di kovara Tîşk hejmara 61`ê de hatiye weşandin. Bo xwendina deqa sereke a vê mijarê serdana vê linkê bikin:

<https://govartishk.com/%da%af%d9%81%d8%aa%da%af%d9%88-%d8%a8%d8%a7-%d8%a8%d9%87%d8%b1%d9%88%d8%b2-%d8%a8%d9%88%da%86%d8%a7%d9%86%db%8c/>